
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (263):

## Gundê "Ciwanên Mala Meqdisê/Eşbal Beyt El'meqdis" yê niştecîkirinê, girtinine bêsûcane, vekirina dibistaneke "Pakistanî" li Reco, vekirina dibistana navendî ya rewayî







Serok Erdoxan li ser rewşên "Xezê" yên niha digirî, û dibêje ku qutkirina elektirîkê, avê, sûtemeniyê û xwarinvexwarinê ne mirovane ye û ciyê wê di zagona şer de tune ye! Û tundûtûjî tundûtijiyê û êş û roxandinê û gurbûnê û tevliheviyê bi xwe re tîne! Û pêdiviye ku dewlet bi yasayên şer û mafên mirovan pabend bin!... Lê, ew wan bingehînan dide jibîrkirin, di şerên xwe de li dijî Kurdan û saziyên wan (ên rêvebirî û sivîlî û leşkerî) li Bakur û Rojavayê Sûriyê ji bêtirî deh salan ve, û herweha tewanên şer û tewanên li dijî mirovahiyê yên ku artêşa wî û Milîseyên Sûrî yên pêve girêdayî dikin, û yê berztirîn jê jî guhertina endeza demografî ye, ya ku derbas asta qirkirina nijadî li dijî Kurdan -weke nijadeke cîwaz- dibe.

**Ev jî hin kiriyar û bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= G. "Eşbal Beyt El'meqdês":**

Li 08.10.2023an. Z, Komela "**Sadakataşi - Kevirê xêrdanê**" ya Turkî Gundê "**Eşbal Beyt El'meqdês**" ê niştecîkirinê (yê ku ji /270/ malî û dibistaneke mezin pêk tê) li Cindirêsê vekir, bi beşdariya serokê wê "Kemal Ozdal"; Û rojnemevanê Turk ê tundperest "Hemze Tekîn - endamê rêvebiriya komelê" di rûpela xwe "El'êks " de aşkere kir ku "gund bi destin Sûrî û hevrêzî û rêkûpêkirineke Turkî û piştgiriyeke Felestînî hatiye avakirin" û "ji bo berjewendiya yên di erdheja dawiyê de malên wan hatine hilweşandin"; Hêjaye were zanîn ku tek malbatekê ji nişteciyên Bajarê Cindirêsê yê wêranbûyî yên resen sûd ji vê gundî wernegirtiye, û tenê anîndeyên parêzgehên Sûriyê yên din tê de hatine bicîkirin, di pêvajoya piroseyên bi armanca kûrkirin û çespandina guhertina endeza demografî de, ji Herêma Efrînê ya Kurdî re.

Herweha çalakvanê Islamî yê Felestînî "Ibrahîm Xelîl" (ê li Bajarê Qudsê rûniştî, daneserên/hemleyên alîkariyên cûrbecûr bi navê "Penaber û koçberên Sûrî" ragîhandiye û peren pir kom kirine, û pê piştgiriya pirojeyina li Bakurê Sûriyê kiriye, bi hevrêziyeke Turkî - Ixwanî) bi riya zincîreke ji weşanan di rûpela xwe ya Fêsbokê de aşkere kir, ku wergirtina peran ji Felestîniyan di demeke pir kin de bû, û despêkirina avakirina gund li destpêka Gulana 2023an. Z bû, bi hevkariya "Komela El'beyreq, Komela Jiyankirina birûmet/El'eyş bîkeramê, Bi hev re dilovan bin - simbolên xêrê/Terahemo - Senabêl El'xêr".

Bi bîr were jî ku gund li ser erdekî (ji dora çar hiktaran pêk tê û desteserkirî, û yî Hemwelatî "Hesen" ê zorane koçberkirî û ji Gundê "Şîtka" - Navça Mabeta) li Rojavayê Gundê "Hemêlkê" - Navça Cindirêsê hatiye avakirin.

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên dagîkeriyê ev girtin:**

**-** Li navîna Rezbera borî, Hemwelatî "**Mistefa Ebid El'rehman Hebîb** /38/sal" çend rojan, ji aliyê milîseyan ve li Navça Bilbilê, û berdana wî piştî ferzkirina vêrgiyeke/900/Dolar Emrîkî li ser, û piştî vegera wî ji ciyê derbederiyê - Bajarê Heleb bo gundê xwe (Qornê).

**-** Li 29.09.2023an. Z, Hemwelatî "**Fehîme Ehmed Tahêr** /25/sal, **Mihemed Ehmed Mistefa Hacî** /40/sal, **Ebdo Ezet Gênc Xemîs** /30/sal" ji xelkê Gundê "Hisê/Mîrka" - N. Mabeta, û bo Navenda Efrînê hatin birin, û ta niha bêsûcane bendkirî ne, bê ku em kanibin tuhmetên wan nas bikin.

**-** Li 10.10.2023an. Z, Xort "**Nezmî Mihemed Hesen** /20/sal", ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" ve - Rêbenda El'qews - derbasgeha Rojhilat a Bajarê Efrînê, li ser riya vegera wî ji ciyê derbideriyê - Bajarê Heleb bo Gundê "Anqelê" - Navça Şiyê, û ta niha çarenûsa wî nediyar e.

**-** Li 11.10.2023an. Z, "**Mihemed Edhem Emîn** /40/sal" (ji Gundê "Coqê" û dîkaneke wî ye firotina perdan û isfincan heye), ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û milîseyên asayêşê ve, ji mala wî li Taxa Efrînê ya kevin, û sedema girtinê û bi kû ve hatiye birin nehatiye zanîn.

**= Tundrewiya Olî:**

Di çarçewa kedên ku toreyên Birayên Misilman/Ixwan El'mislimîn a Cîhanî de, bi serpereştiya Partiya Dad û Geşepêdanê/El'edalê we El'tenmiyê ya Turkî, ji bo belavkirina vexwendinên xwe yên olî û cîhadî yên tundrew:

**-** Li 02.10.2023an. Z, "**dibistanek ji herdu astên amedeyî û navendî re**" bi navê pêncemîn xelîfeyên El'raşîdîn "**Umer kurê Ebid El'ezîz**" li Bajaroka Reco hate vekirin, ji aliyê "Komela Sîlanî ya Pakistanî - Saylani Welfare" ve, bi beşdariya nûnerê wê "El'şêx El'duktor Mihemed Umran Bê" û serokê encûmena xwecihî û endamên wê; Û ew dibistan bi hevrêziya rêvebiriya awerte û xişimûbêtaran a Turkiyê "Afad" hate avakirin, li ser bermaya Dibistana Reco ya Kevin (a ku bi tevahî ji aliyê Artêşa Turkiyê ve hatiye hilweşandin, li dema dijberiya ser herêmê sala 2018an. Z); Û jêdereke xwecihî tekez kir ku dibistan dê ji aliyê Pakistaniyan ve were rêvebirin, û peredandin jî ji komelê.

**-** Bi ser hebûna dibistaneke rewayî berê li Efrînê, û herweha vekirina hejmarek jê li Gundewarê Efrînê di navboriya pênc salên dawiyê de, "Saziya Hînkirina Bêsînor" li 04.10.2023an. Z ragîhand, ku wê dibistaneke

rewayî li bajêr ji dêvla ya kevin ava kiriye, îsal di bin navê "**dibistana navendî ya rewayî li Efrînê - Afrîn imam hatip lisesi**" de - di çarçewa sîstema "Îmam El'xetîb" a Turkî de daye vekirin, da ku dora /400/şagirt bihewîne û guncaw bike, û ew jî bi hevkariya Saziya Rehme Bêsînor - Mercy Without Limits TR û Saziya Layf - Life for Relief and Development.

Pirojeyên niştecîkirin û guhertina demografî yên ku Turkiyê rêvebertiya wan li Efrînê dike, peyman û belgenameyên navdewletî vaja dikin, metirsiyên pêşerojî yên mezin dadimezrînin, û li pêş çareseriya siyasî ji kirîza Sûriyê re dibin kendeke mezin.

15.10.2023. Z

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- G. "Eşbal Beyt El'meqdês" yê niştecîkirinê.
- Vekirina Dibistana Pakistanî (Dibistana Umer kurê Ebid El'ezîz) li Reco.
- Vekirina dibistana navendî ya rewayî li Efrînê (Dibistana Îmam El'xetîb).15.10.2023 an.